Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :991 | 28-Tebax- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Qeşayass Cîlo li ber nemanê ye

**Qeşaya çiyayê Cîlo berî 20 hezar salan çêbûye. Lê roja me ya îro ev qeşa hema hema bi temamî heliyaye.**

Qeşaya çiyayê Cîlo beriya qederê 20 hezar salan çêbûye. dewleta Tirk û gazên kîmyewî yên ku di van êrişên dagirkeiryê de tên bikaranîn.

Bi îdîaya ku dever cihê zivistanan bi cih bûna gerîlayan e, her sal bi hezaran metrekab gazên bi jehr bi kar









Lê roja me ya îro ev qeşa hema hema bi temamî heliyaye. Devî germbûna global û krîza avhewayê, dagirkeriya li Kurdistanê jî di heliyana qeşayên Cîloyê de xwedî rol in. Sedemên herî darî çav a heliyana qeşayê esas ev in:



Operasyonên dagirkeriyê yên tîne li vê deverê û ew jî heliyana qeşayên Çîloyê bi lez dike. Ji bo operasyonên dagirkeriyê rê hatin çêkirin û heta ji bo festîvalan jî rêyên maşînan çêkirin. Ev hemû jî dikin ku qeşa bi leztir bihelin.

Çiayê Cîlo 4135 metreyan bilind e. Sala 1848´an berê qeşayên Çêloyê weke 4 kîlometre hatibû pîvan. Sala 2017´an ev ber mabû tenê 1300 metre. Stûriya qeşayê jî tenê 40 metro mabû. Yanî ji qeşayên Cîloyê êdî hema hema ti tişt nemaye.

***Ozgûr Polîtîka***

# Aîda El-Colan jina yekê ye ku li bajarê Hecînê xwaringehekê vedike

**Aîda El-Colan jina yekê ye ku li bajarê Hecînê xwaringehekê ji xelkê bajêr û gundên derdorê re vekiriye. Xebatkarên xwaringehê hemû jin in.**



Aîda El-Colan a ji bajarê Hecînê xwaringehek bi navê "Ewafî" ku ji 8 beşan pêk tê ji xelkê bajar û gundên derdorê re vekir. Hemû xebatkarên xwaringehê jin in. Aîda El-Colan û komek jin xwarinên cûrbecûr yên gelêrî ên ku li herêmê navdar in pêşkêş dikin.

**"Projeya min xizmeta hemû jinan dike"**

Aîda El-Colan anî ziman ku pirojeya wê ji aliyê hejmareke mezin ji xelkê bajar ve baş hat pêşwazîkirin û wiha got: "Min derfetên kar ji 15 jinan re peyda kir. Projeya min xizmeta hemû jinan dike. Di xwaringehê de çend beş hene, beşek ji bo malbatan, beşek ji bo zarokan, û beşek ji bo metbexa kevneşopî ku xwarinên kevneşopî pêşkêşî dike. Ez yekem jin im ku xwaringehekê li vê herêmê vedike. Ez hemû jinan teşwîq dikim ku hemî dijwariyan derbas bike ji bo serkeftina projeya xwe."

**"Bi saya vê projeyê min karek dît"**

Yek ji xebatkarên xwaringehê Fitêm El-Mihêdî got ku wê bi saya vê projeyê karek dît û wiha axivî: "Ez di metbexê de dixebitim û hemî xwarinên gelêrî çêdikim. Ez ji 9 sibehê heya 4 êvarî dixebitim."

***JINHA***

## Sudoku: 1


| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | | | | 3 | | | | |
| | | 7 | | 8 | 4 | | 5 | 1 |
| 1 | 6 | | 7 | | | | | 9 |
| | | 3 | | 2 | | 1 | | |
| 2 | | | | | | | | 6 |
| | | 8 | | 7 | | 4 | | |
| 4 | | | | | 8 | | 2 | 3 |
| 3 | 9 | | 2 | 4 | | 8 | | |
| | | | | 9 | | | | 7 |

**Bersiv wê di hejmara bê de bê.**

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | M | E | W | Î | J | ■ | A | P | ■ |
| 2 | ■ | Y | ■ | R | I | M | B | A | Z |
| 3 | P | A | N | O | ■ | Î | ■ | L | ■ |
| 4 | A | R | Î | ■ | E | ■ | G | E | H |
| 5 | Y | ■ | G | E | W | R | E | ■ | O |
| 6 | E | B | A | ■ | R | E | N | Î | ■ |
| 7 | ■ | A | R | D | ■ | S | I | N | E |
| 8 | Ê | L | ■ | A | D | E | M | ■ | N |
| 9 | Z | E | N | D | ■ | N | Î | Ş | E |

## Xaçepirs



**ÇEP-RAST**

1. Daçekek ku wateyê xurt dike... Kesê/a ku zimanê wî/wê giran e
2. Zanist... Bi rûsî erê... Rojek
3. Xanedana qraliyeta Vîetnamê
4. Cînavka vegerok... eqreba, xizim
5. Tîpên navîn ê "saet"ê
6. Paytexta Fransayê
7. Awayekî danse, babetek ji şanoya muzîkal... Kurteya rêxistina rizgariya Îrlanda
8. Remil... Kesê ku mirov wî nas nake, nizane bê kî ye
9. Kesê ku di kar û barê xwe de bi pêş neketiye... Cînava kesê yekê a yekjimar

**JOR-JÊR**

1. Daçekek... Birayê diya mirov... Kurteya elementa hesin
2. Pêvek... Diravê ku ji aliyê dewletê ve ji welatiyan tê wergirtin
3. Karker
4. (Rustemê …) Destaneke me
5. Dadwer... Aşît, şepe, berfende
6. Notayek... Ji vir û şûnde, ji niha pê de
7. Kurteya piştî zayînê... Bajarekî me
8. Ji bo bûkê, birayê zavê... Plakaya navneteweyî ya Îranê... Sir, tiştê her kes pê nizane
9. Sureyek Quranê... Amûreke çandiniyê ya ku pê zad tê çinîn

# QSD`ê derb li MÎT'a Tirkiyê xist

Di xala sisiyan ya 'Rûyên Veşartî' de, bi mikûrhatina sîxurên MÎT'a dewleta tirkî ya dagîrker eşkere bû ku, QSD'ê derbeke giran li tora sîxûrên MÎT'ê yên li herêmên dagîrkirî xistiye...R-3



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 991 | 28-Tebax- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# DERB LI AMADEKARIYÊN DAÎŞ`Ê HAT XISTIN



## Pêngava Mirovî û Ewlehiyê bi encam dewam dike

Di roja sêyem ya pêngava Mirovî û Ewlehiyê de, Hêzên Ewlekariya Hundirîn ya bakur û rojhilatê Sûriyê , tûneleke din ya çeteyan dîtin û gelek konên ku çeteyên DAIŞ'ê ji bo perwerdeyê û dadgehkirinê bikar dianîn rakirin...R-3



## 'Bi xurtbûna hêza herêmê ya cewherî wê serkeftin mîsoger bibe'

Îbrahîm Kaban diyar kir ku armanca êrişên dagîrkeriya tirkî koçberkirina gelên herêmê ye û got, rêxistinkirina gelên herêmê û piştgiriya wan ya QSD'ê wê serkeftinê misoger bike...R-4

## Xetera çeteyên DAIŞ'ê ya li Kampa Holê



Di operesyona 'Mirovî û Ewlehiyê' de Jinên li Kampa Holê yên di bin xetera çeteyên DAIŞ'ê de diyarkirin ku xeteriya sûcên çeteyan herku diçe zêde dibe û da zanin ku ewlehiya cane wan qet nemaye...R-3

## 'Wê hesabê kuştina zarokên Kurdan giran be'

Welatiyên bajarê Qamişlo dan zanîn ku armanca Tirkiyê ji êrişa zarokan ew e ku paşroşa vî welatî tine bike. Herwiha gotin, êrişa ser zarokan sûcê herî giran e û divê dewleta tirkî ya dagîrker li ser wan were cezakirin...R5

## Kirmanşan yek ji bajarên herî bedew yên Kurdistanê ye



Bajarê Kirmanşanê, bajarê herî mezin yê rojhilatê Kurdistanê ye. Nêzî 400 cihên balkêş li vî bajarî hene û xwediyê gelek taybetmendiyan e. ***R-7***

## Penaberên Iraqî derbarê xetera Kampa Holê de çi dibêjin gelo?



Hêzên Ewlekariya Hundir bi alîkariya Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ) û Hêzên Sûriya Demokratîk Qonaxa duduyan ya Operasyona Mirovî û Ewlekariyê dan destpêkirin. Penaberên Iraqî derbarê vê Operasyonê de û xetera şaneyên razayî yên DAIŞê de bi rengekî ne eşkere axivîn. ***R-6***

## 'Rêber Apo gelê kurd ji koletî kire pêşengê gelên azadixwaz'..R-2

**Ya esas berjewendiyên stratejîk in!**
Memed Serdar *R-5*

**Li Sûriyê sûcên Erdogan**
Faruk Sakik *R-4*

# Evîn Cûma: Divê civaka navneteweyî li hemberî kiryarên Tirkiyê bêdeng nemîne

Rêvebera Rêxistina Mafên Mirovan ya herêma Cizîrê, bang li rêxistinên mafên mirovan, Neteweyên Yekbûyî û hêzên çalak kir ku rola xwe baş bilîzin û zextê li hêzên navdewletî bikin ku zagonên ji bo parastina mafên welatiyên bakur û rojhilatê Sûriyê derxin.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Êrîşên dagirkeriya Tirkî yên li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, herwiha kiryarên wê yên hovane yên li dijî welatiyên herêmê didomin. Hê jî planên ku Tirkiyê li dijî welatiyên herêmê daye destpêkirin bi dawî nebûne, ji qutkirina ava Firatê dest pê kir, heta ku xak dagîr kir û niha jî bi çekên giran û balafirên bêmirov welatiyên herêmê dike armanc. Li dijî van kiryarên dijmirovî, civaka navneteweyî û rêxistinên ku îdîaya parastina mafên mirovan û zarokan dikin jî, hê bêdeng in.

**`Hêzên navneteweyî mafê binpêkirina zagonên navneteweyî, dane Tirkiyê`**

Derbarê êrişên dagîrkeriya Tirkî yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û pêkanîna kiryaran li dijî welatiyan rêvebera Rêxistina Mafên Mirovan ya herêma Cezîrê Evîn Cuma, ji me re axivî û got, Dewleta Tirk ya deriker di demên dawî de êrişên xwe yên li dijî welatiyan zêde kiriye, bi taybetî li herêma Cizîrê rojek derbas nabe ku bajar û gundewarên herêmê neyên bombebarankirin. Di encamê de jî welatî şehîd dibin, ku piraniya wan kesên ciwan û zarokin.

Evîn di berdewamiya axaftina xwe da xuyakirin ku Erdogan bi palanên xwe yên li dijî gelê herêmê biryara qirkirina gelê herêmê daye û axaftina wiha domand: “Tirkiye dema ku êriş dike qanûn û pîvanên navneteweyî yên parastina mafê mirovan binpê dike û dagirkeriya Tirkî li ber çavê tevayiya cîhanê sûcên xwe dike. Cîhan jî li hember vê yekê bêdeng e, herwiha tê xuyakirin ku hêzên, qaşo ji bo ewlekariya herêmê li herêmê bi cih bûne, destûra binpêkirina mafê mirovan dane dewleta Tirkiyê ya dagîrker û qirker.”

**‘Êrişên balafirên Tirkan pîvanên navneteweyî binpê dikin’**

Evîn Cuma bal kişand ser îsrara dewleta Tirkî ya dagîrkirina herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û zêdekirina pêkanîna balafiran di dema dawî de û wiha got: “Belavbûna balafirên tirkan li ser esîmanê herêmê dide xuyakirin ku êdî Tirkiye ji qanûnên navneteweyî natirse. Herwiha dagirkeriya tirk rojane welatiyan û malên wan bi topên hawinan û balafirên bêmirov hedef digire; jimara welatiyên ku jiyana xwe ji dest dane jî gihîşt 122 û ya birîndaran jî 173’an.”

Rêvebira Rêxistina Mafên Mirov ya herêma Cizîrê Evîn Guma di dawiya axaftina xwe de bang li rêxistinên mafên mirovan, Neteweyên Yekbûyî û hêzên çalak kir ku rola xwe baş bilîzin û zextê li civaka navdewletî bikin, da ku zagonên ji bo parastina mafên welatiyanên bakur û rojhilatê Sûriyê derxîne.

**Jimara kiryarên dewleta tirkî ya dagîrker yên vê salê**

Rêxistina Mafên Mirovan ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê serjimariya binpêkirinên dewleta Tirkî ya dagirker û çeteyên wê yên li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, mîna (bombebaran , balafirên bê mirov, teqîn, qezayên kuştinê û binpêkirina sînor) ku ji 1`ê çileyê heta 20`ê Tebaxê pêk hatine, bi belge kir:

1-Qurbanên di bombebaranên Tirkiyê yên ku bi çekên giran, top û hawinan li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê pêk hatine wihane:
-Li herêma Cezîrê 16 kesan jiyana xwe ji dest daye ji wan 4 jin, zarokek, 9 mêr û 4 leşker, 53 kes jî birîndar ji wan 9 jin, 16 zarok û 10 leşker bûn.
-Li herêma Firatê 33 kes jiyana xwe ji dest dan ji wan 4 zarok bûn û 73 kes birîndar ji wan 8 zarok û 27 mêr û jinek jî birîndar bûn.
-Li bajarê Minbicê jî jimara kesên ku jiyana xwe ji dest dane 8’in, ji wan 4 zarokin û 5 jî birîndar bûne ku di nav wan de zarokek, zilamek û 3 jin in.
2- Serjimara qurbaniyên di bombebaranên Tirkiyê yên bi balafirên bê mirov yên li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê:

-Li herêma Cezîrê 48 şehîd, ji wan 7 zarok, 26 mêr, jinek û 14 leşker bûn, heriwha 50 kesên birîndar, ji wan 12 zarok, 4 jin, 30 mêr û 4 leşker bûn.
-Li herêma Firatê jî jimara şehîdan 11 bûn û yê birîndaran jî 14 e, ji wan 4 jê jinin..



3- Jimara binpêkirinên li ser sînorê Sûriyê-Tirkiyê:
-Li herêma Cezîrê çar bûyerên kuştin û îşkencekirinê, pênc lêdan û destdirêjî çêbûne.
-Li herêma Firatê jî sê bûyerên lêdan û destdirêjiyê çêbûne.
4- Serjimariya binpêkirinên Tirkiyê li yên bi rêya teqîn û qezayên Cînayî li herêmên dagîrkirî:
-Li Serêkaniyê û Girê Spî 2 bûyerên kuştinê û birîndarkirina zarokekî, herwiha 6 birîndarên teqînan ku di yek ji wan jî zarok bû.
5- Jimara binpêkirinên Tirkiyê yên li dijî sivîlan weke kuştin, revandin, şewitandin û birîna daran li Efrînê:
-24 bûyerên kuştinê, 380 revandin, birîna 100 dar û şewitandin 300 darî li Efrîn. Herwiha guhertina demografiya Efrînê û avakirina zêdetirî 8 avahiyên mêtîngeriyê.

# ’Rêber Apo gelê Kurd ji koletiyê kir pêşengê gelên azadixwaz’

**Navenda nûçeyan- Qamişlo**

**Leyla Miwo da zanin ku bi felsefeya Rêber Apo gelê Kurd xwe ji koletiya desthilatdaran rizgarkir û bû pêşengê gelên azadîxwaz.**

Bi armanca têkbirina vîna gelên rojhilata navî, Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan di 15’ê Sibata 1999’an de bi komployeke navneteweyî dîl hat girtin û ji aliyê hêzên komploger ve radestî dewleta tirkî ya faşîst hat kirin. Rêber APO ev 23 sal in di Girava Îmraliyê de tê tecrîdkirin. Ev çend sal in dgîrkeriya tirkî nahêle parêzer û malbata Rêber APO wî bibînin. Dewleta dagîrker di kesayeta Rêber APO de, êrişê hemû gelên azadîxwaz dike amanc.

Derheqê tecrîda girankirî ya li ser Rêberê gelê Kurd Ebdulh Ocalan û kiryarên dagîrkeriya tirkî yên li dijî mafên mirovan, hevseroka Yekîtiya Kedkaran ya kantona Qamişlo Leyla Nahid Miwo ji me re axivî .

Leyla Miwo diyar kir ku tecrîda ser Rêber Apo tecrîda li ser mirovayiyê ye û wiha got: “Tecrîda li ser Rêber Apo tê kirin, mirov dikare bêje tecrîda li ser mirovayiyê ye. Lewra di sedsala 21’ê de fikrê ku li dijî sîstema desthilatdar ya kapîtalîst, pergala Rêber Apo ya Neteweya Demokratîk e. Ji bo wê hêzên hegemon, Rêber Apo dîl girtin û radestî dewleta tirkî ya faşîst kirin. Lê ji ber ku nikarîbûn pêşî li belavbûna pergala Rêber Apo bigirin, dest bi tecrîda girankirî li ser rêbertiyê kirin.”

**’Gelên azadîxwaz li derdora felsefeya Rêber Apo kom dibin’**

Leyla bal kişand ser pergala Rêber Apo ya ku bi parêznameyên xwe li seranserê cîhanê belav kir in û wiha got: “Rêber Apo pergala xwe ya Neteweya Demokratîk bi riya pirtûkên xwe bi gel da nasîn û bi van pirtûkan çavê gelên cîhanê gişan vekir. Rojbiroj felsefeya Rêber Ocalan di cihanê de dibe modela jiyaneke azad. Rêber Apo bû hêviya hemû gelên azadîxwaz.”

**’Rêber APO Kurdên azad afirand in’**

Leyla da zanîn ku armanca dagîrkeriya tirkî têkbirina fikrên



azade û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Dewleta tirkî ji hevdîtina bi Rêbertiyê re ditirse. Lewra eger hevdîtin were kirin wê perspaktîfên Rêbertiyê hem ji bo gelê Kurd, hem ji bo tevayiya gelên azadîxwaz derkevin pêş. Civaka azadîxwaz û demokratîk tev serkeftina xwe di fikrê Rêber APO de dibînin û ev jî ji bo faşîzma desthilatdaran metirsiyan ava dike. Ne dewleta tirkî tenê, tevayiya dewletên hegemon ji vê fikrê ditirsin. Ji ber wê jî destekê didin dewleta tirkî. Armanca wan ji vê yekê fikrên azad ji holê rakin. Lê Rêber Apo bi gelên azadîxwaz re ev plan bêbandor kir. Berxwedana ku rêber APO li Îmralî li hemberî vê sîstemê dimeşîne, ji bo gel bûye hêviya herî mezin ya serkeftinê.”

Hevseroka Yekîtiya Kedkarên Kantona Qamişlo Leyla Nahid Miwo ji gelên azadîxwaz xwest ku li Rêber Apo xwedî derkevin û axaftina xwe wiha qedand: “Ji bo şikandina tecrîda li ser Rêbertiyê, divê em bikarin fikir û felsefeya Rêber Apo di tevayiya jiyana xwe û di sîstema xwe de pêk bînin. Ji bo ku em Rêberê xwe ji nava çar dîwaran derxin, divê em di nava kar û xebatê de bin. Azadiya Rêber Apo, azadiya 50 milyon Kurdî ye.”



# Kirmanşan yek ji bajarên herî bedew yên Kurdistanê ye

Bajarê Kirmanşanê, bajarê herî mezin yê rojhilatê Kurdistanê ye. Nêzî 400 cihên balkêş li vî bajarî hene û xwediyê gelek taybetmendiyan e.



Kirmanşan bajarekî gelek mezin ê Kurdistanê yê Îranê ye gelek kes tê de dijîn, ji derveyî cihên girîng, ev bajar li Rojhilatê Kurdistanê û bajarê herî mezin ê Kurdistanê ye, rûbera wê 93,389,956 metre ye û çargoşe ye, ev bajarê bi cihên xwe yên balkêş û xweş ên cur be cur bûye yek ji bajarên herî balkêş ê Rojhilatê Kurdistanê.

**“Li Kirmanşanê gelek herêmên balkêş hene”**

Herêma Taq Westan dikeve Bakurê Rojhilatê bajarê Kirmanşanê û ji ber vê yekê gelek dîrok û huner tê de heye. Du kevanên mezin û biçûk, hinek nivîs li ser hene. Li ser kevana mezin a Taq Wesan motîfên cur bi cur rewa kiriye, musîqjen lê tê dîtin û di kevana biçûk a Taq Wesan de du nivîsên bi pênûsa pehlewî hatine nivîsandin mane. Di nava cihên ku dikarin li Kirmanşanê werin ziyaretkirin de, çiyayê Bêstûne ku 20 kîlometre dikeve Bakûrê Rojhilatê Kirmanşanê heye. Bazara Nerêtî, aligirê cihgirê Paşa Melîkî, dêra dilê pîroz, şikefta parûf, Serab Nîlûfer, Tavgeya Heşîlan, muzexaneya Kirmanşan, baxçeyê Gulan ku Kirmanşan duyemîn bajarê gulan e piştî bajarê Esfehan, bazara nanê birincê û gelek cihên din ên serdankirinê hene.

**Xwedî bazarên dewlemend e**

Bazara asayî ya Kirmanşanê weke bazara tarî tê nasîn, gelek qumaşên xweşik ên cil û bergên Kurdî yên jinan lê hene ‘Ewrî’ cureyeke serpoşê jinên Kurd e, şilik û gelek cureyên din ên çermê xwezayî, karên destan û gelek berhemên din di nava bazarê de hene.

**Nanê birincê**

Bazara nanê birinc gelek firoşgeh digre nava xwe, gelek caran di nava firoşgeha nan û nanê birinc û nanê xurmeyê de ku berhemên sereke yên Kirmanşanê ne tên amadekirin. Firoşgehên Kirmanşanê dan diyarkirin ku nanê birinc bi rûnê Kirmanşan û ajalan tê çêkirin û tamek xwe ya resen û xweş heye. Malzemeyên vî nanî ji hêl, hêk, arê birincê, zeyta ajalî ya Kirmanşanê, şekir û ava gulan pêk tê
Ji ber cihên balkêş ên Kirmanşanê salane gelek geştiyar serdana Kirmanşanê dikin, çiyayên bilind ên Kirmanşanê di nava bajar de tê dîtin û mezinahî û xweşiktiyek taybet a vî bajarî heye.
***JINHA***

# Ji bo parastina pêdiviyên berê, xaniyê xwe xistiye mûze

**Welatiyê bi navê Salih Akoyî yê ji gundê Akoyan yê girêdayî bajaroka Rewandizê, mala xwe xistiye mîna mûzeyeke hunerî û pêdiviyên berê tê de bi cih kirine. Salih dibêje, çand nasnameya neteweyan nîşan dide, ji bo wê hewl daye çand û kelûpora kurdî biparêze û bi nifşê nû jî bide naskirin.**

Salih Akoyî temenê wî 60 sale, dîwanxaneyek avakiriye û navê wê jî xistiye ‘Dîwanxaneya Paşayê Gewre’ û dibêje ji ber ew gelek ji Mîr Mihemed Paşayê Gewre yê Rewanduzê hez dike, ev nav li dîwanxaneya xwe kiriye.
Akoyi derbarê vî karê xwe de diyar dike armanca wî ewe ku çanda Kurdî ya berê bi parêze. Salih dîwanxaneya xwe li nava hewşa mala xwe de avakiriye û her kesek



bixwaze serdan bike, bi taybetî jî ciwan dikarin herin bibînin.
Li nava dîwanxaneya Akoyî de sê tiştên gelek kevnar hene, yek ji wan xencerek ya serdema Mîr Mihemed Paşayê Gewre yê Rewanduzê



ye, ya din jî rimeke ku serê wê hesin û tûje bi darek zirav ve hatiye girêdan û dîroka wê zêdetirî du hezar sale. Berhemê din yê herî kevin jî mohra qesabxaneya Rewanduzê ye.
Di sala 1983’an de Salih Akoyî dest bi karê wênegirtin û tomarkirina dîmenan kiriye. Bi dehan cûrên kamera û wênegiran bikaraniye. Di nava arşiva wî de bi sedan bîranînên xelkê Rewanduz û Soran hene. Her wiha teyîbek gelek kevin ku bi wê dengê hunermend Şivan Perwer û Nasir Rezazî hatiye tomarkirin jî li cem Salih Akoyî heye.
Salih Akoyî derbarê parastina kelûporên Kurdî de rexne li hikûmeta Herêmê kir û got, “Hikûmeta Herêmê giringî bi parastina kelûpor, ferheng û çanda Kurdî nade. Ev yek jî bandorê li ser têkçûna rastiya jiyana siyasî, ferhengî û civakî heye. Ji berku her welatek dema çand, huner û resentiya wê nema, wê nasnameya xwe ya resen ji dest bide.”
***RONNEWS***

## Nabe ku huner kerr û kor û lal be

Luqman GULDIVÊ



Koma Berxwedan di albûma xwe ya 1987´an ya bi navê Botan de navê Egîd hildida.
Koma Berxwedan di albuma xwe ya 1987´an a bi navê Botan de navê Egîd hildida. Ne piştî pêngava 15´ê Tebaxê, lê piştî şehadeta Egîd ev album û stranа li ser ê hatibû çêkirin. Ez ne şaş bim dengê Xelîl Xemgîn bû, prologek “dixwend”. Piştî wê li dengê dûdûkê me qederê 2 deqîqeyan digihîne melodiyên strana esasî ya li ser Egîd: Bijî bijî heval Egîd, bijî bijî şêrê Kurda, bijî bijî pilingê çiya, serleşkerê hêja.
Lê “serleşkerê ordiya me” piştî şehadeta xwe di hunerê Kurdan de navê wî hatibe hildan jî, ew fîşeka yekê ya ku bû vejîn ji bo miletekî, bi zehmetî rê û dirb ji xwe re peyda dikirin da ku xwe berde nav meydana hunerê şoreşger bi xwe de jî.

Esas li vir û li wir şûn û şopên wê hebûn. Mesela di albuma “Muxtaro” û di strana muxtaro ya Hozan Dilgeş de, “Qereqolên 84´an” ên ku muxtaran xwe bi pereyan firote wan, îşaret bi wê fîşeka yekê jî dikir. Lê albuma 1989´an yekser behsa fîşeka yekê nedikir.
Jixwe marşa 15´ê Tebaxê ya ku koma Berxwedan di albuma xwe bi heman navî ya sala 1993´yan de weşand hema hema 10 salan piştî pêngavê dihat weşandin.
Piştre gelek marş û stranên li ser 15´ê Tebaxê hatin weşandin. Lê xwedê dizane weke marş ya herî zêde li bîra xelkê ma ya Koma Berxwedan bû. Fîşeka yekê çima ewqasî dereng di hunerê Kurdan de dengê xwe da bihîstin? Yan jî pirseke din bikim, çima hîna saleke şerê Bagokê neqediyabû, “bijî şerê me li Bagokê” nemir bû. Ji bo wê jî xwedê ji gorgeheşt Hozan Dilgeş razî be.

Li vir rexneyeke esas pirr dijwar dikim. Lewma tevî ku di propaganda û hunerên ajîtasyonê yên Tevgera Azadiya Kurdistanê de 14´ê Tîrmehê, 15´ê tebaxê bi rola bûyerên damezirîner radibin, sermeselê, filma 14´ê Tîrmehê piştî wê bi 37 salan hat çêkirin. Filma 15´ê Tebaxê hîna jî nehatiye çêkirin û va ye 38 salên wê temam bûn. Weke min li serî jî îşaret pê kir, şehîdbûna fermandarê 15´ê Tebaxê yan jî şehîdbûna 20 gerîlayên pirraniya wan nû perwerde dibûn - li Bagokê - zûtir cihê xwe di wî hunerê Kurdan de yê herî zû aktuel dibe, digire. Em behsa muzîkê û stranan dikin helbet.

Lê ev cihgirtin esas ne ji ber rola damezirîner a bûyeran e, lê bêhtir ji ber rêzgirtina ji şehîdî/şehîdan re ye. Ne ku şerê li Bagokê kêm e. Ew şerekî ecêb bû ku nîşan da komek gerîlayên Kurd dikarin li dijî artêşekê şev û rojekê şerekî giran bikin. Lê axir cihgirtina wê di hunerê muzîkê de ji rêûresmekê feyza xwe digirt. Ew rêûresma ku têkçûn û mirin yan jî şehîdbûna qehremanan bi kilam, stran û muzîkê bi bîr tîne. Ev jî tiştekî çê ye. Lê hunerê me yê ku hêz û feyza xwe ji Tevgera Azadiyê ya Kurdistanê digire, çima li wê zêde nake, yan jî çima kêm lê zêde dike. Egîd qehremanekî welê ye ku hêja ye li ser ji yên heyî bêhtir berhem di her warî de bên çêkirin. Sermeselê ez nizanim çima heta îro kitebeke biyografiyê ya bi rêkûpêk li ser wî nehatiye nivîsîn, çima li ber wê berhemên şano û sînemayê nehatine hilberîn.
Heman pirsê ji bo bûyera ku em îro weke Cejna Vejînê bi nav dikin jî bipirsim. Çima filma heta filmên 15´ê Tebaxê heta îro nehatine çêkirin? Çima berhemeke pak û tekûz a şanoyê xweşik bi vê meselê danakeve?
Diyar e huner vî karî weke yê rojnamevanan dibîne. Yanî hin dosya, hin nivîs wê behsa wê bikin û ew ê çêbe.

Bivênevê ji xwe dipirsim, gelo ji bo xwe “banal” dibînin? Yanî xelk bûyerên damezirîner ên ji bo miletê xwe piştî bi sedan salan jî banal nabînin û her bi awayên nû û hizrên nû wan di çarçoveyên nû yîn damezirîner de bi cih dikin, lê sedem her çi be, Kurd xwe kêm didin ber vê yekê. Divê ev yek biguhere, Kobanê çawa ji bo miletê me bûyereke damezirîner bû, wiha û heta ji wê gelekî wêde, 15´ê Tebaxê bûyereke damezirîner bû. Heger huner nikare vê bibîne, huner gor e. Heger huner nikare bibe dengê wê huner lal e. Û heger huner nikare dengê wê guleya 15´ê Tebaxê nabihîse, huner bêguman kerr e.
***Ozgûr Polîtîka***

# Penaberên Iraqî derbarê xetera Kampa Holê de çi dibêjin gelo?

Hêzên Ewlekariya Hundir bi alîkariya Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ) û Hêzên Sûriya Demokratîk Qonaxa duduyan ya Operasyona Mirovî û Ewlekariyê dan destpêkirin. Penaberên Iraqî derbarê vê Operasyonê de û xetera şaneyên razayî yên DAIŞê de bi rengekî ne eşkere axivîn.

Kampa Holê a ku ji penaberên Îraqî û koçberiyê Sûriyê her wiha ji malbat û hevjînên DAIŞ'ê pêk tên, 45km rojhilatî bajarê Hesekê-Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikeve. Piştî ku Baxoz a Dêrazorê ji aliyê şervanên Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) di 23'ê Adara 2019'an ve hat rizgarkirin, malbatên ku xwe radestî hêzên HSD'ê kirin ji Kampa Holê re hatin veguhestin. Li ser bingehê ku aramî û ewlehiya kampê avabikin û rê li ber qetilkirina jinan û mêran a zêde bigrin di 28'ê Adara 2021'an de Hêzên Ewlekariya Hundirîn bi alîkariya Yekîneyên Parastin Jin (YPJ) û Hêzên Sûriya Demokratîk "Operasyona Mirovî û Ewlehiyê" dan dest pê kirin.

Ji ber qetilkirina jinan a zêde Hêzên Ewlekariya Hundirîn (Asayîş) her wiha bi alîkariya Yekîneyên Parastina Jin YPJ'ê û QSD'ê Qonaxa Duyemîn a Operasyona Mirovî û Ewlehiyê di 25'ê Tebaxê de dan destpêkirin.

Derbarê xeteriya Kampa Holê de jî penaberên Îraqî ji ajansa me re axivîn.

**"Em nikarin bi ti kesekî re bikevin diyalogê, sînorê me heta bazarê ye û hew"**

Aya ji Mûsila Îraqê ye, 5 sal in li Kampa Holê di fêza yekemîn a Kampê de ango beşa Penaberên Îraqê jiyan dike. Derbarê rewşa Kampa Holê û bûyerên ku di nava wê de rû didin wiha dibêje: "Em di hundirê kampê de bi bûyerên qetikirinê dibhîsin. Ma ji derveyî DAIŞ'ê û şaneyên wan wê kî bûyerên wiha bikin?. Operasyona ku Hêzên Ewlekariya Hundirîn dan dest pê kirin, pir baş e ji ber ku êdî kamp ji kesên xirabiyan dikin paqij dibe. Em jî dixwazin ku malbatên DAIŞ'ê ji vir derkevin, ji xwe em ê jî derkevin di rojên pêş de vegerin welatê xwe. Em tenê heya bazarê diçin pêdiviyên xwe tînin û tên konê xwe. Em ji jinên DAIŞ û malbatên wan pir ditirsin ji ber wê em nikarin bi rihetî tevbigerin. Em nikarin bi kesekê/î re bikevin diyalogê, sînorê me heya bazarê ye û hew. Ji derveyî wê em newêrin gava xwe jî biavêjin."

**Bûyerên kuştin, destdirêjî û revandina zarokan**

Cewahir Midî penabereke ji Îraqê ye, 4 sal in ez li vir tevî malbata xwe jiyan dikim. Derbarê rewşa ewlehiya kampê û bêaramiya ku jiyan dikin wiha got: "Dema ku em hêzên ewlekariya hundirîn dibînin em aramiyê hîs dikin, lê



di nava kampê de aramî tune ye berovajî wê heye. Taybet di aliyê bûyerên kuştin, tecawîzkirin û revandina zarokan de. Demê pêş de em ê derkevin û herin Îraqê, em sebir nakin ku kengî vegerin. Em li ser zarokên xwe pir ditisin. Operasyona ku hêzên ewlekariya hundirîn da ye dest pê kirin, em pir jê kêfxweşin û xwezî ku her tim operasyonên wiha hebin. Ji ber ku em aramî û ewlehiyê dixwazin. Em ji ber şer reviyan û hatin vir, em jî dixwazin hêzên li vir aramiyê ji mere peyda bikin."

**"Em bi ti kesî re nakevin diyalogê"**

Ibtîsam Mihemed jî ji bajarê Selah El-Dînê Îraqê ye, sedema hatina wê li vir wiha got: "Di navbera Heşîd El-Şebî û çeteyan de şer derket, ji ber wê em neçar man ku wekî sivîlên ji wir tevî zarokên xwe koç bibin. Em ji mirinê reviyan. Ji buyî wê li vir li kampê jî em têkiliyên xwe bi kesî re çênakin û karê xwe ji kesî nayînin û em bêdeng jiyan dikin. Me deriyê xwe girtiye û diyalogê bi kesî re çênakin. Em li ser zarokên xwe ditirsin ku gotinekê an jî tiştekî fêr bibin, ev jî dibe sedema ku em bi kesî re nekevin diyalogê."

**"Ka kî di binê wan cilûbergên reş de çi dike nake ti kes nizane"**

Hemdiya Mihemed jî ji tirsa ku hevjînên DAIŞ û gefên ku wan xwarine, neçar dimîne ku li ser rûyê xwe bigre û wiha dibêje: "5 sal in ez li kampê dijîm. Roj û salên berê pir baş û aram derbas dibûn lê van salên dawiyê pir nebaş bûn ji bo me. Em hemû cil û bergên reş li xwe dikin. Lê kî di bin wî kirasî de çi dike nake kes nizane. Di vê salê de em ê ji kampê derkevin, vegerin welatê xwe. Ez pir bi hêvî me ku vegerim Îraqê û jiyana xwe ya normal êdî jiyan bikim. Zeviyan biçînim û erdê xwe cot bikim. Dixwazim her tiştê li vir qawimî ye ji bîr bikim. Naxwazin tiştekî ji bîranîn û bûyerên ku me li vir jiyan kir bi xwere bibim welatê xwe. Dixwazim zarokên xwe jî bidim xwendin, raste li vir dixwînin lê ne wekî ku mirov li dibistanê bixwîne û bawernameyan bigre. Ez bi hêvî me ku zarokên me her tiştî li vir jiyan kirine ji bîr bikin û di hişê wan de nemîne."

**"Jin û mêr tên kuştin, lê ka sedem çi ye, ti kes nizane"**

Penabereke din ji Îraqê ye ew jî wiha dibêje: "Hêviya min ew e ku ez ji Sûriyê derkevim û herim Îraqê. Dixwazim hemû sal, meh û rojên ku min li Sûriyê derbas kiriye ji bîr bikim. Em dibihîzin ku jinek ango mêrek hatiye qetilkirin, lê sedema qetilkirina wan çi ye jî nayê zanîn. Li vir kuştin û birçîbûnê heye. Ez dixwazim herim û zarokên xwe xwendin bidim."

***JINHA***

# 'Dixwazin bi ambargoyê îradeya gel bişkînin'

**Şehba/Zana Roj**

**Koçberên Efrînê yên li herêma Şahba diyar kirin ku armanca hikumeta Şamê ji girankirina ambargoya li ser gelê Şehba, têkbirina îradeya gel e û dan zanîn ku siyeseta ku hikumeta Şamê dimeşîne ji bo dagîrkirina xaka Sûrî dibe piştgirî.**

Piştî ku Efrîn ji aliyê dewleta tirkî ya faşist ve ha dagîrkirin, gelê herêmê koçberî herêma Şahba bû. Lê dewleta tirkî ya dagîrker li wir jî, bê navber êrişên xwe yên ser gel bi armanca qirkirina vî gelî berdewam kirin. Herwiha li şûna ku hikumeta Şamê li dijî dagîrkirina tirkî ya li ser xaka sûrî xwedî helwest be û erkê xwe pêk bîne, wê jî gelê koçber xist nava dorpêçekê û ambargoyeke giran danî ser wan. Bi taybetî di vê dema dawî de ku êrişên dewleta tirkî yên ser herêmê zêde bûne, hikumeta Şamê jî ev ambargoya ku 5 sal in dewam dike, girantir kir. Li ser gelê koçber pêwîstiyên pir jiyanî yên weke ard, derman, mazot û kehrebeyê hat qutkirin. Herwiha li dijî polîtikaya dijmirovî ya ku li ser koçberên Şehba tên meşandin ti helwesta saziyên ku qaşo mafê mirovan diparêzên pêş neketine û hêzên navdewletî yên ku li herêmê qaşo ji bo ewleyiya gelê wir bi cih bûyîn jî, bêdengiya xwe heta dawî diparêzin.

Li ser polîtikaya li ser koçberan tê meşandin û siyaseta hikumeta Şamê ya ku ji bo armancên dewleta tirkî dibe piştgirî, gelê Şehba helwest û nêrînên xwe bi rojnameya me re parve kirin.

Endamê komîteya kar û barê civakî ya kantona Efrînê Mihemed Reşîd bal kişand ser dorpêça herêmê ya ku yekser bandora xwe li tevgera gel dike û wiha got: "Hikumeta Şamê ev ne cara yekê ye ku herêma Şehba dorpêç dike, ev 5 sal in herêm dorpêç kiriye. Bi derfetên pir kêm gelê herêmê li vir debara xwe dike. Siyaseta ku hikumeta Şamê li ser gelê Şehba dide meşandin, ji siyaset û planên dewleta tirkî ne qut in. Armanca girankirina ambargoyê bêzarkirina gel e."

Mihmed di derbarê qutkirina pêwîstiyên bingehî yên gel de wiha axivî: "Ev mehek e hikumeta Şamê nahêle ku mazot, gaz, ard û pêwîstiyên lojistîk derbasî herêmê bibin. Ev yek jî bi awayekî neyînî li ser gel û herêmê bandorê dike û di encamê de nan nayê çêkirin, kehrebe tê qutkirin û di heman demê de çûnhatin gelek zehmet dibe. Herwiha ji bo ev alavên bingehî derbasî herêmê bibin, pacên gelek mezin tên xwastin."

Mihemed bal kişand ser îradeya



gel ya ku nayê teslimgirtin û wiha got: "Digel ku gelê herêmê di rewşeke pir zehmet de ye jî, ti carî dev ji têkoşîn û berxwedana xwe bernadin. Di encamê de dijminê gelê Kurd çi dike bila bike, nikare bi van siyasetên bêexlaq îradeya me ya têkoşînê bişkîne."

Bêrîvan Hesen jî siyaseta hikumeta Şamê ya ku li ser Şehbayê dide meşandin wiha nirxand: "Ev ambargoya ku her dem li ser me datînin dibe sedem ku kêmayî di aliyê derman û alavên nexwaşxaneyê de derdikevin. Weke ku tê zanîn di gîştî herêmê de tenê yek nexwaşxane heye, em



hewil didin ku ji gel re bibin cihê çareseriyê. Lêbelê hin nexweşî hene weke şûştina gurçikan, nexwaşiya kezebê û felcbûnê gelek giran in û dermanên taybet ji bo tedewiya wan lazim in. Li hemberî van pêwîstiyan hikumeta Şamê rê nade ku nexwaş derbasî bajarê Helebê bibin, herwiha derbasbûna derman qedexe kiriye. Ev tê wateya ku dixwaze gelê herêmê di nava çembera ambargoyê de bifetisine û bêçare bihêle."

Birîvan Hesen di dawiya axiftina xwe de bang li rêxistinên mirovî kir ku li dijî van sûcan erkê xwe pêk binin.



# Pêngava Mirovî û Ewlehiyê bi encam dewam dike

Di roja sêyem ya pêngava Mirovî û Ewlehiyê de, Hêzên Ewlekariya Hundirîn ya bakur û rojhilatê Sûriyê, tûneleke din ya çeteyan dîtin û gelek konên ku çeteyên DAIŞ'ê ji bo perwerdeyê û dadgehkirinê bikar dianîn, rakirin.

**Navenda Nûçeya/Qamişlo**

Piştî zêdebûna bûyerên kuştinê ku şaneyên veşartî yên DAIŞ'ê, li kampa Holê dikin, Hêzên Ewlekariya Hundrîn û bi piştgirya QSD û YPJ'ê, di 25'ê Tebaxê de qonaxa duyemîn ya pêngava Mirovî û Ewlehiyê li kampa Holê ya Hesekê ragihand.

Li gorî nûçegehana me ku pêngava Mirovî û Ewlehiyê ji nêz ve dişopîne, di roja sêyem ya pêngavê de ragihand ku, Hêzên Ewlkariya Hindrîn, QSD û YPJ'ê di çalakiyên lêgerîn û piştrastkirina nasnameyên di beşa yekem ya kampê de dewam dikin. Herwiha hat zanin ku di encama lêgerînê de tûneleke din ya çeteyan hat dîtin û hijmara tûnelên çeteyan yên ku ji aliyê Hêzên Ewlekariyê ve hatine dîtin, gihişt 5'an. Hêzên Ewlkariyê gelek konên ku çeteyan ji bo perwerdeyê û dadgehkirinê bikar dianîn, ditin û rakirin. Hijmara konên ku ji destpêka pêngavê de hatine rakirin gihşt 33 konan. Li gorî hatibû ragihandin di roja duyem ya pêngavê de 27 çeteyên DAIŞ'ê ku xwe di nava kampê de veşartibûn, hatinbûn girtin.

**'Belgeyên ku kîjan hêz piştgiriya DAIŞ'ê dikin, di destêmede ne'**

Derbarê pêngava Mirovî û Ewlehiyê de, Berdevgê Yekîneyên Parastina GeL ( YPG), Nûrî Mehmûd ji rojnameya me re axivî û diyar kir ku gelek belge di destêwan de hene ku hin hêz piştgiriya çeteyên DAIŞ'ê dikin û da zanin yek ji wan hêzên ku ji destpêka avabûna çeteyên DAIŞ'ê ve piştgiriya çeteyan dike



dewleta tirkî ya dagîrker e.

Nûrî Mehmûd da zanîn ku dewleta tirkî ya dagîrker çeteyên DAIŞ'ê li herêmên dagîrkirî perwerde dike û wiha domand: "DAIŞ'ê ji aliyê wezîrê karê hundirîn, MÎT û waliyên Riha û yê Dîlok'ê ve tê birêvebirin û li herêmên dagîrkirî tên perwerde kirin. Di dema dawî de me ev agahî bi belegeyan tesbît kirin."

**Tevahî derfetên tîrkî di xizmeta DAIŞ'ê de ne**

Nûrî Mehmûd da xuyakirin ku çeteyîn DAIŞ'ê li hin herêmên di navbera Dêra Zorê û Iraqê de xwe bi cih kirine û ji van herêman êrişî hermên bakur û rojhilatê Sûriyê dikin. Herwiha diyar kir ku di dema dawî de hikumeta AKP'ê û MHP'ê tevayiya derfetên dewleta tirkî, xistine xizmeta çeteyên DAIŞ'ê de. Berdevgê Yekîneyên Parastina GeL ( YPG), Nûrî Mehmûd balkişand ser dewama xetera Kampa Holê û axaftina xwe cwiha qedand: "Civaka nevnetewyî gelên herêmê di şerê li dijî DAIŞ'ê de bi tenê hiştin. Ev pêngav barekî girane li ser Rêveberiya Xweser. Em nikarin bêjin wê ev pêngav dawiya DAIŞ'ê bîne, ev tenê tedbîreke demkî ye li gorî derfetên me yên heyî ye. Divê hêzên navnetewyî bi erkên xwe rabin ji ber ku xetera Kampa Holê wê ji bo herkesê dewam bike."

# QSD`ê derb li MÎT'a Tirkiyê xist

**Navenda Nûçeya/Qamişlo**

**Di xala sisiyan ya 'Rûyên Veşartî' de, bi mikûrhatina sîxurên MÎT'a dewleta tirkî ya dagîrker eşkere bû ku, QSD'ê derbeke giran li tora sîxûrên MÎT'ê yên li herêmên dagîrkirî xistiye.**

Di çarçoveya Operasyona Sondê de ku QSD'ê 31'ê Tirmehê dabû destpêkirin, toreke MÎT'ê ku serkêşê wê li Dîlokê ye û kesên girêdayî wî jî li herêmên dagîrkirî karê sîxuriyê dikin, hat têkbirin. Mikurhatinên sîxurên vê torê ku ji aliyê QSD'ê ve hatine girtin, di xala sisiyan ya bernameya 'Rûyên Veşartî' ya Ronahî TV de hatin weşandin.

**Tora MÎT'ê ya li herêmên dagîrkirî**

Serkeşê vê tore, endamê MÎT'ê yê bi navê Mûdîr Ehmed e. Berpirsê îstixbarata Tirkî ya li Efrînê ye, şebekeya li dijî gelê Efrîn, Girê Spî û Serê Kaniyê kar dike. Herwiha li hemû herêmên dagîrkirî tev digere. Kesekî bi navê Îsa jî ku di binê destê Mûdîr de dixebite, berpirsê ofîsa MÎT'ê ya li Dîlokê ye. Herwiha endamên MÎT'ê yên bi navê Neqîb Ebû Muistesim ê ji Hemayê ye jî, li Îskenderûnê dimîne; Ebû Newres jî ji Cerablusê ye û li wir karên qirêjî yên MÎT'ê dike; Hisên Ebdulkerîm Nasir ku bi navê Ebû Muhened tê naskirin jî, ji Hamayê ye û li Dîlokê dimîne ku di encama çalakiyeke QSD'ê de niha felc bûye. Kesê bi navê Ebdulhenan Şêxo jî ji Efrîna dagirkirî ye.

Ev kes hemû di nava vê torê de cih digirin ku ji aliyê QSD'ê ve pilanên wan yên bi MÎT'ê re hatin têkbirin. Piraniya karên qirêjî yên vê torê di ser Ebdulhenan Şêxo re dihatin meşandin. Erkê wî li Rojava û herêmên Rêveberiya Xweser peydakirina sîxuran û li dijî gel bikaranîna wan e. Gelek sîxurên girêdayî wî kar dikin hene.

**Herwiha navên hinek sîxurên din yên vê torê û karê wan wiha ne:**

Ebdo Hemûd Qedûr ku ji Til Rifetê ye, di navbera Efrîn û Dîlokê de diçe û tê û karê qirêjî yê MÎT'ê dike. Mihemed Hecazî ji Efrînê ye, endamê Partiya Azadî ye ku berê yek ji partiyên ENKS'ê bû û herêmên Şêxmeqsûd û Şehbayê di hedefa karê wî de ye. Mihemed Ebdulkerîm Billo ji Efrînê ye û niha li wir dimîne. Îbrahîm Mihemed Hîlal ji Helebê ye. Ev kes 24 seatan bi berpirsyarê torê li Efrînê Henan re diçe û tê û hemû karên sîxuriyê li dijî herêmên Rêveberiya Xweser bi rê ve dibe. Heman kesî jineke ji Idlibê jî kiriye sîxur, nave wê jî Muîne ye. Sîxurê bi navê Mehmûd ku mirovê Henan e ji Efrînê ye, lê li Kobanê dimîne. Her wiha 2 kesên li Minbicê xwediyê dermanxanê ne û yekî ku xwediyê dikana balê jî, endamê vê torê ye.



# Xetera çeteyên DAIŞ'ê ya li Kampa Holê

**Navenda Nûçeyan/Hol**

**Di operesyona 'Mirovî û Ewlehiyê' de Jinên li Kampa Holê yên di bin xetera çeteyên DAIŞ'ê de diyarkirin ku xeteriya sûcên çeteyan herku diçe zêde dibe û da zanin ku ewlehiya cane wan qet nemaye.**

Li Cîhanê kampa Holê yek ji kampên herî mezin û bi xetere. Çimkî jimareke mazin ji malbat, rêveber û serkêşên çeteyên DAIŞê lê dijîn. Hata niha jî ev xeterî dewam dike. Ji destpêka avakirina kampa ve, ji ber hişmendiya DAIŞ`ê, pirbûna koçberan û hebûna koçberên ji gelek welatan, li kampê her tim alozî û pirsgirêk derdikevin. Herwiha rojane kesên ku di hundirê Kampê de dijîn, li ser destên çeteyên DAIŞ`ê, tên kuştin. Çeteyan bi şevê dest bi liv û tevgerê dikin û bi awayekî hovane sûcan li dijî kesên li wir dimînin, pêk tînin. Bi taybet li dijî jinan van sûcan pêk tînin. Ji destpêka salê ve 44 kes bi demançeyên bêdeng, alavên tûj û çekan hatine qetilkirin û cenazeyan diavêjin kanalîzasyona herî nêzîk.

Ji ber rewşa ewlehiyê ya li kampa Holê Gelek jinên li kampê dimînin newêrin behsa bûyerên li wir bikin, hin ji wan jî dema ku behs dikin, newêrin navê xwe bidin. Ji ber ku çeteyên veşartî yên li wir yekser wan dikujin.

Ji bo ku em hê zêdetir rewşa li kampê nas bikin em bi hin jinên koçber re yên ku li wir dimînin axivîn. Lê jinan ji bo parastina ewlehiya xwe, navê xwe nedan. Jinan ji me re behsa rewşa xwe ya li kampê kirin. Hin jê dema ku diaxivîn di nav axaftinên



xwe hêsir ji cavên wan dibariya, diyar dibû ku rewşa wan li kampê pir xirab e.

**`Em newêrin bi rehetî tev bigerin`**

Yek ji wan Jinên koçber yên li kampê da zanîn ku di dema koçberkirinê de, ew û zarokên xwe ji neçarî hatin li kampa holê bi cih bûn û nizanîbûn ka rewşa li kampê çawa ye. Herwiha got, rewşa me li vir pir xirab be, em newêrin bi rehetî tev bigerin. Çimkî em ditirsin ku jinên çeteyên DAIŞ me bikujin. Êdî nizanim çi ji we re bêjim, ji aliyekî newêrim bêjim, ji aliykî jî nizanim çi bêjim.

Jineke din jî diyar kir ku ew pir zehmetiyan li kampê dikşînin. Lê ji bo ku parastina xwe bikin elaqê xwe ji ti kesî naynin û şev û roj parastina xwe dikin. Herwiha got, em ji 2018`an ve hatine kampê. Rewşa kampê wê wam salan ji ya Îsal pir baştir bû. Çimkî îsal rewş zêde xirab bûye û awlehî qet nemaye.

Heman jinê di derbarê pêngava 'Mirovî û Ewlekariyê' jî got, ev pêngave teybet ji bo jinên di bin tirsa çeteyên DAIŞ'ê de pir baş bû. Em bi hêvîne ku ev pêngava ewlehiyê berdewam bike da kuem bikarin li vir jiyanekê ewle bijîn û pêşî li sûcên çetayan bê girtin.

# ’Bi xurtbûna hêza herêmê ya cewherî wê serkeftin mîsoger bibe’

Îbrahîm Kaban diyar kir ku armanca êrişên dagîrkeriya tirkî koçberkirina gelên herêmê ye û got, rêxistinkirina gelên herêmê û piştgiriya wan ya QSD’ê wê serkeftinê misoger bike.

**Mihemed Xanim / Qamişlo**

Dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê piştî civîna Tehran û Soçî êrişên xwe yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê zêde kirin. Her roj gelek deverên kantona Hesekê, Qamişlo, Kobanê, Girê Spî, Minbicê û gundên navçeya Şêrawa ya kantona Efrînê topbaran dike.

Di encamê de gelek welatî şehîd û birîndar dibin. Herî dawî di encama êrişeke bi balfirên bêmirov yên dagîrkeriya tirkî ya ser navenda Şehba de, 4 welatî şehîd bûn û 7 welatî jî birîndar bûn.

Li hemberî van êrişan amadekariyên mezin ji aliyê gelê herêmê, Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê û QSD’ê ve tên kirin. Li ser mijarê şîrovekarê siyasî û berpirsê Tora Jeostratejîk ya Lêkolînan, Îbrahîm Kaban ji me re axivî.


**’Armanca dagîrkeriya tirkî koçberkirina gelên herêmê ye’**

Kaban diyar kir ku armanca Tirkiyê ji zêdekirina êrişên ser bakur û rojhilatê Sûriyê, valakirina tevayiya hermên Kurdan yên ser sînorê wê ye û wiha domand: “Armanca zêdebûna êrişên dagîrkeriya tirkî yên bi balafirên bêmirov yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, koçberkirina gelên bakur û rojhilatê Sûriyê û bi taybetî gelê Kurd e. Ji liv û tevgera Tirkiyê tê xuyakirin ku tenê ji bo êrişên bi balafirên bêmirov erêkirin ji Amrîka û Rûsya girtiye. Stratejiya dewleta tirkî ew e ku Kurdan li ser sînorê xwe nehêl e û malbatên çeteyên xwe yên ku ji herêm û welatên cuda anîne, li wir bi cih bike. Ji ber wê êrişên xwe dewam dike û dixwaze tirsê bêxe dilê welatiyan.”

**’Stratejiya herî guncaw li hemberî êrişên Tirkan bersivdayîne’**

Kaban da xuyakirin ku di vê demê de bersivdayîna hêzên QSD’ê ji êrişên Tirkan re pir girîng e û wiha dawamî da gotinên xwe: “Dweleta tirkî ji demokrasî û projeya Rêveberiya Xweser ya ku li kêleka sînorê wê çêbûye, ditirse û sîstema wê ya faşîst tehemul nake ku herêmeke demokratîk li kêleka wê bê avakirin. Ji ber wê êrişên xwe yên ser herêmê dewam dike. Li hemberî van êrişan bersivdayîn pir girîng e. Dema ku QSD’ê bersiva êrîşan dide, ew ji her kesî re teqez dike ku hêza wê heye ku bersiva her êrişê bide û li ber hewldanên dijminan bisekine. Stratejiya herî baş li hemberî êrişên Tirkan, parastina rewa ye.”

Kaban bal kişand ser bêdengiya hêzên navnetewyî ya li hemberî kiryarên dewleta tirkî ya dagîrker û wiha dewam kir: “Piştî şerê di navbera Rûsya û Ukraynа de, li aliyekî NATO û li aliyê din jî Rûsya, dixwazin Tirkiyê zêdetir bi aliyê xwe ve bikişînin. Ji ber wê her kes çavê xwe ji êrişên dagîrkeriya tirkî yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê re digire, pêymanan bi wê re imze dikin û berjewendiyên wê diparêzin.”





**’Ji bo têkbirina destkeftiyên Kurdan Erdogan xwe diavêje himbêza her kesî’**

Kaban da zanîn ku ji bo têkbirina projeya Neteweya Demokratîk, Erdogan xwe diavêje himbêza her kesî û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Ji bo şkandina Rêveberiya Xweser, Erdogan bazarê bi her kesî re dike û heta rûmeta xwe jî difiroş e. Li gorî daxuyaniyên berpirsên Tirkan, wê Erdogan bi Esed re bicive û opozisyona Sûriyê ya girêdayî xwe bi temamî teslîmî Rêjima Şamê bike. Opozisyona Sûriyê ya girêdayî Tirkan jî, heyvanê exlaq û rûmetê li cem nîne. Mumkin e piştî lihevkirina Şam û Tirkiyê, ev opozisyon vê carê bi destê hikumeta Şamê şerê Rêveberiya Xweser bike.”

Kaban bal kişand ser peymanên qirêj yên navbera hêzên ku dijminatiya Rêveberiya Xweser dikin û wiha got: “Hêzên cîhanî yên emperyalîst ku li ser xwîna gelan û tevlîheviyên li Rojhilata Navî politikayên xwe dimeşinin, projaya Rêveberiya Xweser ya demokratîk li ser berjewendiyên xwe xeter dibînin, ji ber wê her kes çavê xwe ji êrişên dewleta tirkî re digire. Herwiha Rûsya, Îran, Tirkiyê û hikumeta Şamê hewl didin ku Rêveberiya Xweser û projeya demokratîk ji holê rakin. Ew hewl didin ku hebûna rêjimên dîktatorî li Sûriyê, Îran û Tirkiyê mayînde bikin.”

**’Li hemberî êrişan rêxistinbûn girîng e’**

Şîrovekarê siyasî û berpirsê Tora Jeostratejîk ya Lêkolînan Îbrahîm Kaban bal kişand ser girîngiya rêxistinbûnê li hemberî êrişên dagîrkeriya tirkî û axaftina xwe wiha qedand: “Ji Rêveberiya Xweser û gelên herêmê tê xwestin ku xwe pirtir birêxistin bikin û ji bo her êrişê amade bin. Çimkî êrişên Tirkan yên ser herêmê wê dewam bikin.”



## Li Sûriyê sûcên Erdogan

Farûk SAKIK

Nivîskar Ahmed Kahraman di rojnameya Yenî Ozgûr Polîtîka de, 3 nivîs li ser hewldanên çokdanîna Erdogan ya li ber deriyê Beşar Esed nivîsîne. Di dawiya nivîsa sisiyan de dibêje, gelo Erdogan ewqas li vê axê sûc kirin dibe ku Esed bi destê wî bigire?

Ezê ji vê derê dest pê bikim. Û ezê di vê nivîsê de sûcên Erdogan yên li ser wê xakê li hemberî wan gelan kirîn rêz bikim:

- Li pêşiya çareseriya ‘Şerê Sûriyê’ bû asteng. Riyên çareseriyê tev xitimandin.
- Çiqas çekên li Libya û rojhilatê Balkanan ji aliyê CIA ve hatibûn komkirin, bi pereyên dewleta Qeter û Siûdî kirîn û bi balafiran anîn li Tirkiyê. Piştî demekê dema ku ji van balafirxaneyan, bi TIR’ên MÎT’ê xwest derbasî Sûriyê bike, li ser sûc hat girtin.
-Sewqiyata çekan ya derveyî hiqûqê biçekkirina rêxistinên cîhadist kir.
- ‘Gaza Sarîn’ li ser Tirkiyê re derbasî Sûriyê kirin. Ev yek jî bi belgeyan hat isbatkirin.
-Piştgiriya El-Qaîde û bi dehan komên cîhadîst hat kirin. Ev çete, li Tirkiyê bi navê Tevgera Efserên Azad, Artêşa Sûrî ya Azad (OSO), Konseya Sûriyê ya Neteweyî û hikûmeta demî hatin birêxistinkirin. Piştî van gavan, di qada navneteweyî de fermiyetek dan wan û berê wan dan Sûriyê. LI Sûriyê êrişî mirovayiyê kirin.
-Hevkariya dagîrkeriyê bi DAIŞ’ê re. Dema dît ku DAIŞ berî rejima Sûriyê têk çû, ew bixwe derbasî wê valayiyê bû. DAIŞ’iyên ji ber çekên şervanan xilas bûn, li Tirkiyê bi cîh kirin.
-Talankirina dewlemendiyên Sûriyê. Mînak: Li Helebê, Organîzasyona Sanayî ya Erdogan û Beşar bi hev re bi merasimekê vekiribûn, hemû ji hev xistin û birin Tirkiyê.
- Dagîrkirina Efrînê û hin deverên din.
- Li herêmên dagîrkirî guhertina demografiyê.
- Herêm xistin herêmên Tirkî. TL (Pereyê Tirkan) xistin tedawulê. Hin hikûmetên sembolîk ava kirin.
- Piştî çete perwerde kirin û şandin herêmê wan jî ev sûc kirin: Revandin, dizî, talan, destdirêjî, fîdye, işkence, kuştin, revandin û widakirina jinan.
- Komkujiyên Mezhebî.
- Erdogan piştî civînên Astana Rûsya û Tahranê soz da van dewletan ku wan rêxistinên cîhadîst ku li hemberî rejimê şer dikirin, ji Hama, Hums, Heleba, Rojhilat, Xûta Rojhilat, bejayiya Şamê û Qûneytra derxe û bibe li sînorê xwe bi cîh bike. Soz da ku di binê kontrola wî de bin. Muxalifên ku xwestin li hev werin li bajarên xwe man. Yên radîkal jî tevlî karwanê Tirkiyê bûn. Îro jî hatine li Idlibê bi ser hev de kom bûne. Erdogan li hemberî van çeteyan jî sûc kir. Malbatên van cîhadistan di nava çerxa şer de hêran. Gelek ji wan mirin yan jî koçber bûn.
- Li herêmê di êrişên sekvanî de gelek kes şehîd bûn.
- Û hwd.

Piştî rêzkirina van sûcan emê bipirsin bi kîjan rûyî tuyê herî Semerqendê? Lê gotineke Kurdan heye, dibêjin; “Tif kirine rûyê beqê, beqê gotiye, rûyê min ji ava çeman şil nabe, ma wê bi tifa we şil bibe”. Ev Erdoganê em nas dikin, wê here Semerqendê.

Me xwest bi bîra Beşar Esed bixin. Piştî van sûcên Erdogan, wê destê xwe dirêjî wî bike yan na? Her kes vê meraq dike. Û dîsa em gotineke Esed ya 22’yê Cotmeha 2019’an (https://www.youtube.com/watch?v=QUTQBcGx7DE) ji nû ve bi bîra wî bixin: “Erdogan û mirovên xwe, genimê me, fabrîqeyên me û petrola me dizîn û îro jî axa me didizin.”

Ahmed Kahraman gotibû; “Ez texmîn nakim bi destê Erdogan bigire” û piştre ev peyv lê zêde kiribû: “Lê dinya dinyaya bêbextan e.” Ka emê jî binêrin Beşar wê bêbextiyê li Kurdan bike yan na?



# ‘Wê hesabê kuştina zarokên Kurdan giran be’

Welatiyên bajarê Qamişlo dan zanîn ku armanca Tirkiyê ji êrişa li ser zarokan ew e ku, paşroşa vî welatî tine bike. Herwiha gotin, êrişa ser zarokan sûcê herî giran e û divê dewleta tirkî ya dagîrker li ser van sucan were cezakirin.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Ev çend sal in dewleta tirkî ya dagîrker bê navber û bi rengekî hovane êrişî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dike. Di dema dawî de jî dagîrkeriya tirk êrişên xwe zêde kirine û herî zêde zarokan dike amanc. Bi sûcên xwe pîvan, nirxên mirovayiyê û mafên zarokan binpê dike. Herwiha tevayiya zagon û belgenameyên Neteweyên Yekbûyî paşguh dike. Kiryarên dewleta tirkî ya dagîrker û hov îtiya wê ku gelek komkujî bi serê gelên herêmê yên resen de anîne mîrasa Împaratotiya Osmanî ye û dixwaze vê mîrasê zindî bike . Di encama van kiryaran de zarokên bakur û rojhilatê Sûriyê tên koçberkirin, kuştin û canê wan tê parçekirin. Li hemberî vê rewşê cîhan tev bêdeng e.

Derbarê êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê de, bi taybetî hedefgirina zarokan, şêniyên bajarê Qamişlo dan zanîn ku êrişên li dijê zarokan pêk tên sûcên dijmirovî ne û gotin, divê dagîrkeriya tirkî li ser van sûcan were cezakirin.

**`Armanc ew e ku paşroja me tine bike`**

Welatiya bi navê Şemsa Mihemed da zanîn ku dewleta tirkî ya dagîrker zarokên Kurd ji bo xwe xeter dibîne û axaftina xwe wiha domand: “Dewleta tirkî ya dagîrker êdî ji mirovayiyê pir dûr ketiyê û kiryarên pir giran li dijî zarokan pêk tîne. Heriwiha ji ber ku Tirkiye pir tengav bûye êdî nizane ka çi bike, ji ber wê berê xwe daye zarokan û rojane êrişî cihên ku zarok lê hene dike. Armanca wê ji hedefgirtina zarokan ew e ku paşroşa welatê me tine bike. Çimkî baş dizane ku di paşrojê de yên ku parastina nirx û destkeftiyên vî welatî bikin zarokên in. Herwiha zarokên me weke xetereke mezin li ser xwe dibîne. Ji bo wê jî bi êrişên xwe hewl dide nifşê nû yê Kurd ji hole rake.”



**`Divê dagîrkeriya tirkî were cezakirin`**

Şemsa Mihemed got, kiryarên ku li dijî zarokên me pêk tên em wan qebûl nakin û emê hesabê van kiryara bixwazin. Ev kiryarên ku dewleta tirkî dike, li gel xwedê jî nayên qebûlkirin. Divê dagîrkeriya tirkî were cezakirin. Ma heta kengî wê zarokên me werin kuştin û mafê wan were xwarin.”

Şemsa Mihemed di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku wek welatiyên bakur û rojhilatê Sûriyê heta dilopek xwîn di laşê wan de hebê wê li hemberî kiryarên Tirkiyê têkoşîn bikin û tola zarokên xwe rakin.

**`Rêxistinên di binê navê parastina zarokan de dixebitin li hemberî kuştina zarokên Kurd bêdengin’**

Welatiyê bi navê Xesan Abid jî diyar kir ku êrişên dewleta tirkî yên li ser zarokan dermirovî û ne exlaqî ne û wiha pê da çû: “Ev êriş sûcûn herî mezin in û divê dewleta tirkî li ser bê cezakirin. Tirkiye ji ber gunehê zarokên me wê ti caran bi ser nekeve. Ew zarokan dikuje, lê nizane ku kuştina zarokên me çiqas çiqas guneh û sûcekî giran e. Tirkiye nikare zarokên me tine bike. Her ku zarokekî dike hedef, hêz û berxwedana zarokên me yên din xurttir dibe.”

Xesan Abid bal kişand ser bêdengiya hêzên navnteweyî û rêxistinên hiqûqî û ev yek li axaftina xwe zêde kir: “Em bêdengiya li dijî kiryarên Tirkiyê bi tundî şermezar dikin. Çimkî ev bêdengî diyar dike ku hêzên navneteweyî jî hovîtiya Tirkiyê qebûl kirine û rê li ber vekirne ku kiryarên xwe dewam bike. Heta niha rêxistinîn ku di binê navê parastina mafê zarokan de dixebitin ti daxuyanî derbarê vê rewşê de nadane û li ser vê yekê nesekinîne.”



Xesan Abid di dawiya axaftina xwe de bang li civaka navneteweyî û rêxistinê mafê zarokan kir ku li hemberî vê rewşê berpirsyariyên xwe bi cih bînin. Herwiha zextê li dewleta tirkî ya dagîrker bikin ku êrişên xwe yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, bi taybetî yên ser zarokan bide sekinandin.

## Yê esas berjewendiyên stratejîk in!



**Memed Serdar**

Hişmendiya dewlet û desthilatdariyê li gorî berjewendiyên xwe her merheleyê de taktîk, stratejî, uslûb û rê û rêbazên cuda esas digire. Gelek caran di navbera siyasetê de ku ji xwe re esas digire nakokiyên pir mezin derdikevin. Wek mînak, derbare mijarekê de îro pîvanekê diyar dikin û wek xeta sor bi nav dikin, lê piştî demekê ew xeta sor tê guhertin û siyaseteke berûvajî wê tê esasgirtin. Vê rewşê sekneke bêpîvan nabînin, berûvajî wê bi aqil tevgerandin dibînin.

Civakên weke civaka me, ya ku manewîyatê esas digire tevgerandina siyaseta rast, bi pîvan û bi sinc weke tiştеke nebe, nabe ye. Ji ber wê îro tiştek gotin û sibe berûvajî vê tiştek dingotin, di civaka me de bêpîvanî û bêsincî ye. Siyasetmedarên bi hişmendiya dewletê tev digerin ji ber vê taybetmendiyên wan pir zû eşkere dibin û nikarin xwe bi civakê bidin pejirandin.

Siyasetmedarên ku niha bi hev re tev digerin, axaftinên wan derbarê hev de kiribûn lê binerin, bi çi rûyî dikarin werin cem hev tiştekî pir balkêş e. Di navbera hinek ji wan siyasetmedaran de jî, ne tenê axaftinên xirab hatine kirin. Derbarê welatê hev de kar û xebatên xerakirinê ya herî giran hatine meşandin, dijminayiyeke fermî pêş ketiye.

Lê di gel vê jî, dema mijar dibe berjewendî, hemû xetên sor dikarin daynin aliyekî û carekedin weke ku tiştek nebûbe hevdîtin û îttîfaqan bikin. Mînaka yekê ya şirîka Erdogan ya hikûmetê, partiya faşîst MHP û serokê wê Bahçelî`ne. Tê zanîn gotinên ku Erdogan û Bahçelî ji hev re gotîn mirovên herî ketî jî wan gotinan bi hêsanî bi kar naynin. Lê niha ji bo berjewendiyên siyasî, bûne şirîkên hev û dostaniyê dikin. Herwiha mînaka herî balkêş, Erdogan û Esed berî niha dostayiya wan gihiştibû asteke wisa ku civîna wezîran ya hevbeş çêkin. Ev dostayiya wan destpêkirina `projeya Rojhilata Navî ya mezin` bi mûdaxaleya Surî re hat guhertin û li şûna dostayiyê dijminayiyeke mezin girt.

Tişta ku wê demê Erdogan û Esed gihandin hev dijminayiya Kurdan bû. Piştî ku li hemberî Kurdan komploya navneteweyî pêş ket û li gorî wan Kurd lawaz bûn, projeya `Bihara Ereban` dest pê kir. Li gorî pêwîstiyên siyaseta `Bihara Ereban` diviya weke gelek dewletên Rojhilata Navî li Sûrî jî tevlîhevî û parçebûn pêş bikeve.

Berpirsiyarî û pêşengiya mûdaxaleya Sûrî Erdoxan girt ser xwe. Bi navê artêşa azad û pişt re bû artêşa Surî ya neteweyî bi hezaran çeteyên bermayiyên DAIŞ û El Qaîdê birêxistin kirin û li hemberî dewleta Sûrî dan şerkirin.

Lî gorî plansaziya projeya `Rojhilata Navî ya Mezin` li ser Sûrî herî zêde çend mehekê de diviya bi ser bikeve. Erdogan berî sê rojan li mizgefta Emewî de gef dixwar. Plansaziya çend mehan gîhîşt 10 salan, lê her roj ji serkeftinê dûrtir dikevin.

Wek encam rewşa ku îro gîhîştinê, fêm kirin ku domandina vê rewşê ji gelek aliyan ve ne pêkan e. Bi taybetî dewleta Tirkiyê ji aliyê leşkerî, aborî, dîplomasî û civakî ve tengaviyeke pir mezin heye. Ji hemûyan girîngtir jî, ji encama şer û bê istîqrariya demdirêj ku Kurdan xwe nîzîkî azadiyê kiriye û statûya Rêveberiya Xweser ji aliyê gelek welatan ve fermî tê naskirin û ev rewş wê mayînde bibe. Di civîna Tehran û Soçî de eşkere bû ku dewleta dagîrker ya Tirkiyê di stratejiyên xwe de guhertineke bingehî